# Li Ewropayê edalet tenê bi **#nurmitlinks** dibe

Di 9ê Hezîranê de Hilbijartina Ewropayê ye. Partîya Die Linke, ji bo ku Yekîtiya Ewropayê (YE) sosyal (civakî) bibe û dewlemendî bi awayekî adil li Ewropayê belav bibe, tevdigerin. Em ji bo parastina avhewaya adil û aşitiyê têdikoşin. Hikûmet û rastgir zêdetir çek û artêşên bihêztir û têlên bilindtir li dora sînorê Ewropayê pêşbixin hewldidin xwe. Kêm xemên mirovan didin ber çav: jiyana rojane nema kar dike. Mesrefên veguhertina enerjiyê jî dê ji hêla kesên ku jixwe têra wan xem e dê were hilgirtin. Vîzyona me ji bo Ewropayê cûda ye: Em ji bo berjewendiya hevpar, bêtir dadmendî, bêtir wekhevî şer dikin. Ji bo nexweşxane û dezgehên lênêrînê yên ku ne di borsayên Ewropayê'da ne. Ji bo veguhestina herêmî ya ku dixebite û ji bo rêwiyan belaş be. Ji bo rêwîtiyek ku Ewrûpayê bi hev ve girêdide. Ji bo ku dewlemendiya mezin a li Ewropayê bigînei hemû kesî. Ev pêkan e. Ger ku em bi hev re xurt bin. Ji rastgirên ku mirovên feqîr an penaberan dixin bin bandora xwe, xurtir e. Ji lobiyên ku berjewendiya pargîdaniyan û ji nû ve çekdanînê didin pêşiya xwe bihêztir e. Em, ji ber van sedeman dengê we dixwazin.



**Tîma Serekeya Endamên me bo Ewropayê**

V. l. n. r.
Özlem Alev Demirel
Gerhard Trabert
Martin Schirdewan
Carola Rackete

09.Hazîranê da partîya **Die Linke hilbijêrin**

# Avhewayê biparêze, ne berjewendîyên pargîdanî (Fîrmeyên dewlemend yên herî mezin)

Karesata avhewayê jiyana zarokên me yên li ser rûyê erdê tehdîd dike. Mirov çiqasî dewlemendtir be, ew qas zêdetir CO2 derdix e. 100 pargîdan dibe sedema piraniya berbelavbûna CO2. Hikûmeta federal nikare bi van sedemên herî mezin ên guherîna avhewa re mijûl bibe. Pargîdan fonên hukûmetê werdigirin da ku ew hilberîna xwe veguherînin hewa-dostane. Qezenc û berdêl berdewam diçe nav bêrîkên taybet. Buhayên CO2 li kesên ku jixwe bi zorê debara xwe dikin bi taybetî dijwar dike - ji bo super-dewlemendan jî ev guherîn qîmeta pereyek piçuk e.
Daxwaza partîya çep: rêwerzên zelal ji bo pargîdaniyan û alternatîfên rast ji bo mirovan. Em ji bo veguheztinek enerjiyê bi hilberînerên enerjiyê yên neqezenc û bihayên li gor pîvanên civakî tevdigerin. Ji bo ji nûve avakirina aboriyê ya dostane ya avhewa ku karên ewledar û bi meaşên baş diafirîne. Ji bo kêmkirina fîyeta CO2 em daxwaza arîkariya perê avhewayê yê civakî dikin, da ku mirovên bi dahatîyên kêm û navîn pistgirî bê kirin.


Addictive Stock / photocase.de

# Meaş ji bo jiyan, ne ji bo zindîmayin

Qezencên pargîdanan bilinde. Bes meaş na. Mesrefên kirê, xwarin, benzîn, ceyran û germkirinê giranin. Ji bo gelek mirovan êdî pere heta dawiya mehê namîne. Zêdetirî 100 mîlyon mirov li Ewropayê bi meaşin kêm dixebitin - li gorî meaşin li welatên xwe. Li Almanyayê ji şeşan yek, li Almanyaya Rojhilat jî ji sisêyan yek bi tam wext dixebite. Şîrket ji mûçeyên kêmtir ên li welatên din ên Yekîtiya Ewropî sûd werdigirin da ku zêde qezenc bikin. YE daxwaz dike ku meaşin xizaniyê (feqîrîyê) neyên dayîn û daku hemû karker di bin peymanên tarîfê bên parastin. Li Almanyayê heman ne nîvî ye jî. Lê hikumeta Elman tiştekî nake. Li Almanyayê pêvîste saeta meaşin herî kêm a zagonî 14,14 Euroyî zêdetir be. Daxwaza partîya Die Linke: dor 15 euro be! Zexta xebatê li ser kar zêde dibe û perê saetên zêde ku li serhev kombûne bilind dibe. Partîya Die Linke ji bo karê ku karker bikarbin: Di heftê da 4-rojî an jî dora 30 saetan kar bikin, têdikoşe: bi meaşên perê baş û bêtir karkeran.




Martin Heinlein

# Dîtina Parastinê

Yên ku bextewariya me tehdîd dikin ne penaber in, bes lê dewlemendên super-dewlemend ên ku dewlemendiya xwe di bihiştên bacê de vedişêrin in. Em dixwazin li ser sînorên Yekîtiya Ewropayê mirinan rawestînin û nehêlin kes bixeniqe. Qanûna deryayî ya navneteweyî mafê maf û rizgarkirina kesên li ser behrê hewce dike: em dixwazin wê vekirî, pêbawer û qanûnî organîze bikin. Kaosa li ser sînoran têkçûneke siyasî ye. Pêwîstî bi prosedurên penaberiyê yên pêbawer heye, ku bi hiqûqa navneteweyî û mafên mirovan re li gel hev in, heye. Divê mesrefa wî di nav YE'yê de bi awayekî adil bên belavkirin. Şaredariyên ku penaberan qebûl dikin divê fonên zêde bistînin.

# Feqîrî (Xêzanî) ji holê rakin

Zêdetirî 120 mîlyon mirov di bin xetera xizaniyê de ye - li Ewropayê ji çar zarokan yek rûbrû ye. Xizanî li her derê heman rûyê xwe wek heve: teqawid şûşeyan berhev dikin. Malbat nikarin perê betlaneyên xwe bidin. Zarok bê taştê li dibistanê rûdinin. Yên din li kolanan dijîn. Gelek mirovên xizan bi meaşên erzan li welatên dewlemend, wekî karkerên emele an di karên lênihêrîna 24 demjimêran de dixebitin. Xizanî her tim têkçûna hikûmetan e. Divê YE piştrast bike ku li hemî welatan torek civakî ya ewledar were afirandin: Alîkariyên civakî û meaşên kêmtirîn tarif ên zagonî divê li hember xizaniyê bêdayîn. Ji bo Almanyayê em daxwaz dikin: perê teqawidê û perê alîkarîyên civakî ne di bin 1200 euro da be! Ewlehiya civakî şertê jiyaneke bi rûmet e. Ger pargîdanî û dewlemend van şertan û berpirsiyar tevbigerin, dê ew bêbicî. Em palbendin ji bo alîkariyên civakî yên baş û ji bo wê yekê ku mirov ne girêdayî alîkariyên sozyal bin: da ku meaş û teqawid têra jiyaneka wan baş bive. Ji ber ku xizmetên giştî belaş e. Ji ber ku kîrya xanî û enerjî bikarbe bêdayîn.


Michael Breyer

# Tû qezenc li ser hesabê tenduristiyê nabe.

Li benda randevûya doktor, emeliyata pencęşêrê, li odeya lezgîn. Karmendên hemşîre ji hêza xwe wêdetir dixebitin û pîşeyê westiyayî dihêlin. Ev jiyana rojane ya li Elmanyayê ye. Kesên feqîr bêhtir bi nexweşiyên kronîk dikevin û zû dimirin. Li Ewropayê û li Almanyayê jî rast wisa ye. Partîya Die Linke, ji bo lênêrîna çêtir ji bo hemûyan, bêyî ku dahatiyê wan bide ber çav, tevdigere. Welatên din ên Ewropî di pergala lênihêrîna tenduristiyê de bêtir butçe vedqetînin, ji her nexweşek bêtir hemşîre hene û pere çêtir didin wan. Ev ji bo karkeran û ji bo nexweşan baş e. Partîya Die Linke dixwaze lênêrînê û tenduristiyê bi qencî û hewcedariyên hevpar re li hev bike - divê ew nekevin bin qaîdeyên pêşbaziya Ewropî. Divê destûr neyê dayin ku nexweşxane û avahîyê lênihîrînê qezencan li hîsedaran belav bikin. Pêdivî ewe ku vegere bo tenduristî û lênihêrînê. Divê YE fonan peyda bike û piştgirî bide şaredariyan, da ku nexweşxaneyên arizîkirî (prîvat) bibne yê bo gel.

# Hêzkirina tevgerê, tişta ku mirov û civakê bi hevdigre

Sinifên dibistanê pir mezin in. Ger mamoste nexweş be ders tên betalkirin. Dîtina cihek bo zarok di baxcezarokan da gelek zehmet e. Perwerdekar bêsînor dixebitin. Xanîyê kevn ji bo malbatê pir piçûk e - xanî bi kirêya erzan û maqûl tune. Veguhastina herêmî û trênan, hetta pirtûkxaneya bajêr û hebûna navendek bo ciwanan? Li gelek deveran ev deng wek utopya ye. Xizmetên giştî yên baş ew e ku mirov û civakê bi hev re digire. An na: yên ku dikarin dihatîya wan hebe, zarokên xwe dişînin dibistanên taybet û xanî bo xwe dikirin. YE ji bo arizîkirinê (prîvatî) didewsîne, xizmetên gelemperî ji bazarê re tênhiştin. Rêca vê yekê li her derê YE û di jiyana me ya rojane de têdîtin: arizîkî biha ye. Çep dixwaze ku pêşîya arizî (prîvat)taybetmendî û berjewendîbûnê ji peymanên YE derxe. Em ji bo xizmetguzariyên giştî yên baş bi kadroyên têr re tevdigerin: ji bo kirêya xaniyên erzan. Ji bo perwerde û ferbûna bê pere. Ji bo tenduristî û lênihêrîna bi organîze ya gelemperî bo hemûkesî.


Rawpixel.com / Shutterstock

# Dewlemendiya, bo hemû kesî

Ji sedî 1 yê herî dewlemend xwediyê nîvê dewlemendiya Ewropayê ye. Corona, şer û krîz ji bo gelek kesan tê wateya kêm pere û bêtir xeman. Dewlemendiya herî dewlemend pir zêde bûye. Çima? Ji ber ku gelek welatan -wek Almanya- bac ji bo dewlemendan kêm kirine. Ji ber ku kirê, ceyran û erzaqê zêde dibin û hikûmet sermayeya çekan dide. Ev yek xwedan û hîsedarên pargîdaniyan dewlemend dike. Ger li Elmanyayê baca serwetbûnê ji nû ve were danîn, dibe ku sinifên dibistanan piçûktir bibin, veguhestina giştî erzantir bibe û dê cihên lênêrîna rojane zêdetir bibin. Newekheviya di navbera jor û jêr de her ku diçe mezin dibe. Her ku diçe newekheviya di navbera dewletên YE'yê de jî zêde dibe. Ev ji bo mirovan nebaş e, ji bo hevgirtina Yekîtiya Ewropayê û ji bo demokrasiyê jî xirab e. Em dixwazin li seranserê Yekîtiya Ewropî bacên li ser qezencên pargîdanî û mal û mîrasên super-dewlemendan zêde bikin. Li Almanyayê em ji 1 mîlyon euro (kêm deyn) baca serwetê dixwazin. Sermayeyên ji 1 mîlyar euroyî jî ji sedî 12 bêt bac kirin: Nehewce ye ji 999 mîlyon euro zêdetir be.

## 10 sedemên ku dengdayin ji bo **Partîya Die Linke**

nurmitlinks.de

Die Linke


Westend61 / photocase.de

# Li şûna firokeyên taybet çuyînhatina giştî ya belaş

çuyînhatina herêmî ya baş pêşkeftî, bêpere û ji bo hemû kesî: ev ji bo me, ji bo bajarên me û ji bo avhewayê baş e. Em dixwazin çuyînhatina giştî li her derê Yekîtiya Ewropî berfireh û belaş bikin. Bi mîlyar dolaran hewceye ku ji bo xetên zêdetir, gihîştin, zêdekirina frekansa, girêdanên çêtir li deverên gundewarî û şert û mercên çêtir ên xebatê ji bo karkeran werin avakırın. Wê hingê çuyînhatina gelemperî dê bibe alternatîfek rastîn ji bo otomobîlan û her kes dê mobîl be. Bi rayênhesin ku baş kar dike, em dikarin Ewrûpayê nêzê hev bikin û rêyên rojane yên ku mirov li ser wan diçin kar berfireh bikin. Partîya Die Linke dixwaze rayênhesin bike wesîleya herî girîng a çuyînhatinê li Ewropayê: bi rayênhesinî yên çêtir û vagonên nûjen, bi trênên şevê yên rehet. Hemû bi bihayên bi arzan. Dûv re trên ji balafêr ra dibe alternatîfek rastîn. Parastina avhewayê ya adil a civakî tê wateya rawestandina zêdegaviyên super-dewlemendan: Em dixwazin li YE firokeyên taybet û mega yatan qedexe bikin! Em dixwazin betalkirina bacê ya ji bo gaza hewavaniyê were rakirin.


Christian Mueller / Shutterstock

## **Em di têkiliyêda ne.**

**Instagram:** @dielinke
**TikTok:** @die.linke
**X:** @dieLinke
**YouTube:** @dielinke
**Facebook:** linkspartei

**Bürger*innentelefon:**
030 24 00 99 99

kontakt@die-linke.de
www.die-linke.de

**Partei Die Linke**
Kleine Alexanderstraße 28
10178 Berlin

V.i.S.d.P. Katina Schubert / Ates Gürpinar

# Qezencên sergirtî, bihuştên bacê bigirin

Shell, Lidl, Aldi û pargîdan û şirketên din di dema şer û krîza enerjiyê defîyêten xwe buha kirin. Xwarin sêyek biha bûye û enerjî bûye nîv biha. Buhayên zêde bi pereyên bacê hatine kêmkirin. Dîsa jî kesên ku bac didan li ber sermayê qefilîn. Enflasyon ne hêzeke xwezayî ye. Zêdebûna biha tê vê wateyê: Divê em bêtir bidin û pargîdan qezencên xwe mezin bikin. Partîya Die Linke dixwaze pêşî li van qeyranan bigire û ji wan sûd werbigire. Ev pêkan e: Ger ji qazancên zêde bac were derxistin, êdî ji bo zêdekirina bihayan ti teşwîq namîne. Em bang dikin ku li YEyê ji sedî 90 bacek zêde ya qezencê li ser hemî qezencên zêde were dayîn. Divê bihayê ceyran û gazê ji bazarê re neyê hiştin. Em bihayên sosya (lcivakî) dixwazin. Pargîdaniyek mezin a navneteweyî li Yekîtiya Ewropî bi kêmanî ji sedî 19 bacê dide, bes dema ku nanpêjek li teniştê dora ji sedî 30 dide. Em dixwazin rê li ber bihuştên bacê û dûrxistina bacê bidin. Di encamê de YE her sal 835 milyar euro winda dike. Em ji bo pargîdaniyên mezin ên li Ewropayê bacên herî kêm ên yekgirtî dixwazin.


Halfpoint / Shutterstock

# Veberhêna li ser aştiyê, ne bo şer

Şerê hovane ê êrîşa Pûtîn li dijî Ukraynayê gelek kesî şok kir. YE dewletan mecbûr dike ku ji nû ve xwe biçekin û bêtir pere razînin. Hikûmeta federal 100 mîlyar euro ji bo Ordîyê (Bundeswehr) veqetand. Encam ji bo hin hinan: di pîşesaziya berevaniyê de qezencên zêde, nirxên stock deh qat zêde kir. Ji bo me yên din: qutkirina teqawidiyê, xizaniya zarokan, kêmbûna lênihêrîna hemşîre û kêmbûna xanî. Bûdçeya çekan zêde dibe, alîkariya bingehîn a zarokan hat rawestandin. Niha behsa bikaranîna çekên nukleerî û hêzên bejayî tê kirin. Pevçûn berdewam dike, mirin berdewam dike. Her kesê ku xwe bispêre mezinbûnê xetereya şerek cîhanî heye. Partîya Die Linke dixwaze ku şer weke navgîneke siyasetê bê qedexekirin. Li şûna şandina çekan zêdetir, danûstandinên ji bo agirbest û aştiyê hewcetî heye. Em dixwazin çekên nukleerî qedexe bikin. Gava ku nûnerên lobiya karsaziyê îdia dikin ku divê em di navbera „çek an rûn" de hilbijêrin, wê hingê em dibêjin: „Ji bo hemîyan rûn!" Ji nû ve çekrakirin rawestînin!